# ŞAH XOŞÊN

Vê carê li welatê rojê yan welatê çiyastan û Kurdstanê em behsa bîrmend û wêjemend û rêberekî Kurdê Yarsanî dikin bi navê Şah Xoşîn yan jî Bawe Şah Xoşên, em berê xwe bidin bîr û baweriya wî bîrmendê mezda ka çawa fikiriye û çi nivîsiye û çi ji me re hiştiye.

Weku di pirtûka pîroz a Serencamê de jî hatiye “Bawe Şah Xoşên” navê wî “Mubarek Şah”e û nasnavê wî “Baba Xoşên yan Şah Xoşên”e. Kurê Celale xanim keça Mîrza Aman ê dajdar û hakimê Loristanê ye. Gor çavkaniya ola Yarsaniyê û bi taybet Serencamê, di sala 1015an a zayinê de li Loristanê dê bûye. Mubarek Şah her ji zarokî ve naszedê Şah Xoşênê bûye. Şah Xoşên çaxa zarokiyê xwe li Loristanê derbas kiriye, dûre berê xwe daye xwendinê û bo demekê çûye bajarê Hemedanê û li wir xwendin temam kiriye. Gor tekstên pîroz di temenê 32 salî de ruhê xwedayî di wî de dacih bûye û bûye pêşeng û rêberê Yarsanê. Çendîn heval û hevrêyên zana û ‘arif pey xwe hiştite bo mînak: “Babe Tahîrê Hemedanî(Hûryanî), Babe Feqiyê Loristanî, Babe Buzurgê Loristanî, Pîr Şalyarê Hewramî, Kake Reda, Hendolle, Xobiyar, Heyder, Qazî, Nebî Sergetî, Pîr Xidir, Liza-xanima Caf, Reyhan-xanim hwd…” Li ser felsefe, nemişt û baweriya Yarsanî û li gor felsefeya “DON A-Û DON”ê anku “gostina ruh ji laşek bo laşek din” ew xwe di heman ruhê “Mewla Alî – Îmam Alî”yê de dibîne her weku di vê beyta helbestê de xuya dibe:

Min ce terîqet aw im bî zelal
We nam xwên am we rûy kar
Dusît sal ney wirnedum melam
Aman we bîsat we şîrîn kelam

Anku “Ez niha weku Şah Xoşênê têm dine, dused sal berê di don tenê Mewla de bûm”

Şah Xoşên di tafa ciwaniyê xwe de dest bi helbest nivîsandinê kir û du beytî dinivîsand li ser awaza Tenbûrê di Cemxaneyan de û ji hêla yar û peyrewkarên Yarsanî weku stran dihatin xwendin û gotin. Helbestên wî yên yaran û peyrewkaran dûre bûn komhelbest bi navê “Derwrê Şah Xoşên” û her bi vî navî hate navzed kirin.

Tiştê ku di ayina Yarsanî de berçav e û tê dîtin gor nivîsandina Sernecamê, gonîn û şibhandinek di navbera Şah Xoşên û Îsa Mesîh de heye çun ku ew jî weku Îsa Mesîh bê bav hatiye dine, weku dêya wî di helbestekê de vedibêje: bi rêya daj û hukimeke asimanî avis bûye, lê xelkê Loristanê wê bi bîjî(zol) dizanîn, lew rastî natûrên xerab bûye û weku Meryema pakîze bi destê xelkê heman êşa wê dîtiye. Weku dibêje:

Kake reya siwarê dana
Ye hukimê ama ce heft asmana
Xelkî Loristan be zolîş mizana

Rêbazên Edebî yên Şah Xoşênê:
Helbestên Baba Xoşên gelek caran di çarçoveya îdolojiya Yarsanî derdikeve, weku van mînakên jêrên tê xuya.

Yarsan wera, Yarsan wera
Way heq rastiyen, biranan wera
Pakî û rastî û nêwekî û rida
Qedem we qedem, ta we menzilga

Şah Xoşên di vê sirûdê de Yarsan weku ayina rast û durist dizane û weku wê rêyê dibîne ku mirov digihîne Bextiyariyê, di vê helbestê de daxwaz dike ku gav bi gav helbestvanên ayinî pêwîste bêne ber dîd.

BEŞEK JI HELBETÊN WÎ:

Heyderî nazdar, heyderî nazdar
Ez çenî tomen, heyderî nazdar
Perê qebale, mekere înkar
Liza kaweroş, bigîre qerar

Di vê du beytê de bi Alîre dipeyve û dixwaze bi wî bide fêmkirin ku ew jî wêneyeke ji mezda, bila bi eşkere di nav xelkî de bi navê ayinekê din jî hatibe naskirin.
*
Mamam celal e, kakam rengîn e
Don we don aman, çîn e we çîn e
Ha îsta yûrt û nam im xweşîn e
Her keş bişina som, pakîş mewkîn e

Di vê du beytê de bi eşkere efsaneya dêbûna xwe tîne zimên.
*

Ez çenî tomen, şehryar bê gerd
Qella Kengawer, ane bê û gerd
Dûr tenay derya, ême berwarerd
Namekey meşîne, êmey berd ew ferd

Şaîr di vir de du bûyeran tîne zimên, yekê kelha Kengawerê, ew ê dî dûrre.
Kelha Kengawerê kelh, koşk û serayeke kevnar bûye, peristgehekê têde bûye, weku yek ji mezintirîn peristgehên cîhanê hatiye hejmartin.
Şah Xoşên di vê du beytê de bi Pîr Şalyarê re dipeyve û dibêje:
Ey Pîr Şalyarê pak, kelha Kengawerê ewê tirs xistibû dilê xelkî, bi fermana xweda wêran bû, ji wê rojê ve gewhera pak hatiye afirandin, Adem hate dine û em jî ji pişta wî derketin.

*

Ey meyî bê gerd, ey meyî bê gerd
Rastîm da we to, ey meyî bê gerd
Rastîm dawet to, şert im reda berd
Namî Meşyane, êmey bird we ferd

Şah Xoşên di vê du beytê de bi Meyî ya keça xwe dipeyve û jêre dibêje: Rastî ji te re dibêjim û soz jî didim kak Reza ku ji rastîyê dernakevin, bi navê Meşyane(hewwa)yê ji dewra zeryayê em hatine der.

*

Bi giştî ev beşek bû ji danasîn û hin taybetmendî, hişmendî, bawerî û edebiyat Şah Xoşên ê Kurd ê Yarsanî. Şah Xoşên gorî dîroka heyî di sala 1074an de li geştekê ber bi bajarê Kirmaşanê li nêzî Hersînê koça dawîyê kiriye.

Amadekar: Qendîl Şeyxbizînî

Beşek ji çavkanî: “Dîroka Edeba Kurdî” ji nivîsa Dr. Marif Xeznedar/Berga Yekem